Hallo
Basel-Stadt

Kanton Basel-Stadt

# Rewşên lezgîn û ciyên şêwirmendiyê

Jimarên rewşa lezgîn
Ciyên şêwirmendiyê

# Jimarên rewşa lezgîn

Her roj 24 saetan dikarin xwe bigihînin jimarên rewşa lezgîn. Jimarên kin (ên bi sê reqeman) her dem belaş in. Mirov ji bo jimarên din bi gelemperî bi qasî tarîfa telefonên malê (tarîfa normal) dide.

## Jimara banga lezgîn a gelemperî: 112

Mirov bi vê jimarê xwe digihîne navenda banga lezgîn a polîsan. Li gor cureyê rewşa lezgîn, polîs agahiyê dide ciyên din jî (wek mînak, saziya agirkujiyê).

## Polîs: 117

Mirov bi vê jimarê xwe digihîne navenda banga lezgîn a polîsan.

## Saziya Agirkujiyê: 118

Mirov bi vê jimarê xwe digihîne navenda saziya agirkujiyê.

## Alîkariya destpêkê / xizmeta rizgarkirinê (ambulans): 144

Mirov bi vê jimarê xwe digihîne navenda operasyona xizmeta rizgarkirinê. Divê mirov jimara 144 tenê gava hewceyî alîkariya lezgîn be û pêdiviya xwe bi ambulansekê hebe, yan mirov rewşê nikaribe binirxîne (wek mînak piştî qezeyekê), bi kar bîne.
Mirov ji bo pirsgirêkên din ên bijîjkî destpêkê têkiliyê bi bijîjkeke malê, bijîjkekî malê re datîne. Di kêliyên derveyî demên vekirîbûna mûayenexaneya bijîjkên malê de, mirov dikare di rewşên ne bi xetereya jiyanî de, her dem bi jimara 061 261 15 15 telefonî Navenda Banga Lezgîn a Bijîjkiyê (Medizinische Notrufzentrale, MNZ) jî bike. Mirov li wê derê şêwirmendiya bijîjkî distîne û ew mirov dişînin ciyê rast ê herî nêzîk (bijîjk, nexweşxane). Bi tenê serê xwe jî derfeta lêgerîna navendeke rewşa lezgîn (nexweşxane/mûayexaneya rewşa lezgîn) heye.

## Dermanxaneya rewşa lezgîn: 061 263 75 75

Mirov bi vê jimarê xwe digihîne dermanxaneya rewşa lezgîn (Notfallapotheke) a Basel-Stadtê. Dermanxaneya rewşa lezgîn a li Petersgraben 3 hem bi şev û hem jî dawiya hefteyê her dem vekirî ye û mirov li wir dermanên rewşa lezgîn jî peyde dike.

## Bijîjkên diranan ên rewşa Lezgîn: 061 261 15 15

Gava qezeyeke diranan çêbibe, bi lez telefonî bijîjka xwe ya diranan an bijîjkê xwe yê diranan bikin. Di kêliyên derveyî demên vekirîbûnê de telefonî navenda banga lezgîn a bijjkî (MNZ) 061 261 15 15 bikin. Mirov bi vê jimara telefonê, hîn dibe, bê kîjan bijîjkên diranan li kantona Basel-Stadt ji bo xizmeta rewşa lezgîn li ser kar in.

## Jehr-banga lezgîn: 145

Ger mirov tiştekî jehrî daqurtîne, yan guman bike ku tiştkî jehrî daqurtandiye, bijîjk û kesên pisporên beşê bi vê jimara telefonê alîkariyê dikin. Ew ji we re dibêjin, bê di rewşeke jehrîbûnê de divê çi were kirin. Lêbelê di rewşên xetareya jiyanî de, divê mirov bi lezgînî telefonî jimara 144 bike. Hûn dikarin li ser malpera internetê agahiyên berfirehtir ên li ser mijara jehr û jehrîbûnê bibînin.

## Şêwirmendiya ji bo mezinan: 143

Telefona bi jimara 143 (Destê alîkariyê, Dargebotene Hand) ji bo kesên, ku dixwazin bi telefonê li ser her cureyê pirsgirêkên xwe biaxivin e (bi almanî, fransî, îtalî û ingilîzî). Mirov dikare di rewşên krîzê de, lê belê ji bo hemû tengezarî û xemxwariyan telefon bike. Axavtin bawerîdar û bê nav e (ji kesên din re nayê gotin). Mirov li ser daxwazê agahiyên din ên li ser derfetên alîkariyê distîne. Danîna têkiliyê ya bi riya e-mail û chatê jî pêkan e.

## Şêwirmendiya ji bo zarokan / ji bo ciwanan: 147

«Jimara telefonê ya 147» ji bo zarok û ciwanên dixwazin bi telefonê li ser her cure pirsgirêkên xwe biaxivin e (bi almanî, fransî, îtalî). Mirov dikare di rewşên krîzê de, lê belê ji bo hemû tengezarî û xemxwariyan telefon bike. Kesên pisporên beşê serê saetê amade ne. Axavtin bawerîdar û bê nav e (ji kesên din re nayê gotin). Telefonkirin belaş e û li ser fatûreya telefonê nayê nivîsîn. Danîna têkiliyê ya bi riya e-mail û chatê jî pêkan e.

## Banga lezgîn a dêûbavan: 0848 35 45 55

Bi telefona banga lezgîn a dêûbavan (Elternnotruf) kesên pisporên beşê şêwirmendiya pirsên li ser perwerdekirinê yên dêûbavan an kesên din dikin. Gava hûn hest pê dikin, ku danûstendina bi zarokan re li ser we barekî giran çêdike û hûn yan ji bo zarokên xwe yan ji bo zarokên din xema hin tiştên zarok dikin, dixwin, ew kes alîkariya we dikin. Dîsa gava mirov bikeve nav tirs û gumana, ku zaroka we yan zarokeke din dibe yan bûye qurbaniyê bikaranîna xerab a derûnî/bedenî, mirov dikare serî li telefona banga lezgîn a dêûbavan bide. Axavtin bawerîdar û li ser daxwazê bê nav e. Danîna têkiliyê ya bi riya e-mailê jî pêkan e. Banga lezgîn a dêûbavan ji bo pirsên bijîjkî nikare bibe alîkar.

## Zordariya navmalê (Jin): 061 681 66 33

Mala jinan a her du Baselan (Frauenhaus) serê saetê şêwirmendî û alîkariya jinên li rastî zordariya nav malê hatine, dike. Kesên ji malbatê û yên xebatkarên beşê jî dikarin serî li vî ciyî bidin. Axavtin bawerîdar û li ser daxwazê bê nav e. Agahiyên berfirehtir ên li ser mijara zordariya navmalê, ji bo mêrên bi serê wan de hatiye jî û agahiyên têkiliya bi ciyên din ên serlêdan û şêwirmendiyê re, dikarin li bin sergotara zordariya navmalê ya malpera hallo-baselstadt.ch werin dîtin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/notfaelle-und-beratungsstellen/notfallnummern

# Ciyên şêwirmendiyê

Li kantona Basel-Stadtê ciyên cihêreng ên şêwirmendiyê hene. Hinek cî şêwirmendiya pirsên gelemperî dikin. Ciyên din şêwirmendiya mijarên diyar dikin. Şêwirmendiya destpêkê bi gelemperî belaş e. Gelek caran naxwaze hûn ji bo şêwirmendiya dûvretir jî heqdest bidin. Li gelek ciyan şêwirmendiya bi gelek zimanan heye.

## Ciyên şêwirmendiya gelemperî

Ciyên şêwirmendiya navendî ji bo koçber û penaberan

- GGG Migration
  Xebatkarên Saziya Koçberiyê GGG seranseriya rojê bersiva pirsên li ser mijarên cihêreng ên li Swîsreyê bi 14 zimanan didin. Dibe ku hûn li kurseke almanî yan li derfeteke ji bo integrasyonê digerin. Ji bo vê jî xebatkarên Saziya Koçberiyê GGG alîkariya we dikin. Şêwirmendî li ser telefonê yan jî rû bi rû ye. Ya baş, ji berê ve serî lê bidin. Navê hûn ji bo wê heqdest bidin.

Agahiyên mafê penaberiyê û mafê koçberiyê

- BAS Beratungsstelle
- Freiplatzaktion

Ciyên din ên şêwirmendiyê

- Wekî din jî gelek ciyên şêwirmendiyê yên mirov şêwirmendiya gelemperî bistîne, hene. Hinek cî bi zimanekî derveyî almanî jî şêwirmendiya we dikin.
- Hûn dikarin li ba komeleyên koçberan jî bi zimanê xwe agahiyên gelemperî bistînin.

## Birêvebiriya kantonê / birêvebiriya şaredariyê (DE)

Gelek caran rayedarên li niştgeha we jî dikarin alîkariya we bikin, wek mînak birêvebiriya kantonê yan birêvebiriya şaredariyê. Dibe ku xebatkarên wir karibin bersiva pirsên we bidin. Yan jî ewê ji we re bibêjin, bê kîjan ciyên şêwirmendiyê dikarin alîkariya we bikin. Hûnê li ser malpera rayedaran jimarên telefonan, navnîşanên e-mailan û agahiyên din bibînin.

## Ciyên şêwirmendiyê yên pispor

Li herêma Baselê gelek ciyên şêwirmendiyê yên li ser mijareke diyar şêwirmendiya we bikin, hene. Wek mînak: kalûpîrî, kar, mayîna li vir, xwendin, zewac/hevberdan, perwerde, malbat, debara aborî (deyn/butçe), tenduristî, zordariya navmalê, integrasyon, pirsgirêkên derûnî, lênêrîna pitikan, ducanîbûn, zayendî, kêşbûn, pirsên civakî. Ji bo şêwirmendiya destpêkê, pirî caran navê hûn heqdest bidin. Hûn dikarin agahiyên têkiliyên hin ciyên şêwirmendiyê yên li gor mijara hûn dixwazin, li ser malpera "Hallo Basel-Stadt" bibînin. An jî ji ciyê agahî û şêwirmendiya GGG Migration bipirsin. Xebatkarên van deran bi gelek zimanan diaxivin û ewê li ser derfetên şêwirmendiya hûn dixwazin, agahiyan bidin we.
Hûn hîn baş bi almanî naaxivin? Wê demê dibe ku li ba ciyê şêwirmendiyê pêdiviya we bi wergerekê, wergerekî hebe. Berî hûn biçin wê derê ji ciyê şêwirmendiyê bipirsin. Hinek ciyên şêwirmendiyê dikarin bi zimanên din jî şêwirmendiya we bikin. An jî ew cî dikarin ji we re keseke din, kesekî din ê ji we re wergeriyê bike, bibîne. Dibe ku divê hûn bi xwe keseke/kesekî ji we re wergeriyê bike, bi xwe re bînin.

## Cudakariya nijadî

Hûn bi cudakarî yan nijadperestiyê re rû bi rû man? An jî hûn bûne çavdêrê cudakarî yan nijadperestiyê. Ciyên hûn dikarin serî lê bidin hene:

- "STOPP Rassismus" ciyekî şêwirmendiyê yê kantona Basel-Stadt û Basel-Landschaftê ye. Şêwirmendî belaş û bawerîdar e. Hûn dikarin telefon bikin, bi xwe werin wir an şêwirmendiya online bixwazin.
- «Netzwerk Antirassismus" gava nijadperestî yan cudakarî bi serê we de were, alîkariya we dike.
- "Stiftung GRA" ji bo cudakariya dij-cihûtiyê şêwirmendiya we dike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/notfaelle-und-beratungsstellen/beratungsstellen